



**ENCAM Û PRENSÎBÊN
PÊŞNÛMAYA MALBATÊN NOBEDARÊN ZAROKÊN XWE**

17 Tebax 2022

Stenbol/TYB Şaxa Stenbolê

18 Tebax 2022

Dîyarbekir/ Pêşîya Mizgefta Kurşunlu

Serokê Şanazîn ê Lijneya Lidarxistina Komxebatê: Mustafa AÇIKGÖZ –Wekîlê Nevşehîrê yê AK Partîyê

Koordînatore Komxebatê: Doç. Dr. Adem PALABIYIK – Zanîngeha Bitlis Eren

Serokên Lijneya Lidarxistina Komxebatê: Ferdi DİNÇ-Mustafa ÇINAR-Metin SAKINÇ

Platformên Komxebatê: MİSMED Komeleya Medyaya Civakî û Platforma Medyayê

Endamên Lijneyê :

Ahmet DURKAYA (Serokê Platforma Medyayê)

Ferdi DİNÇ (Serokê MİSMEDê)

Metin SAKINÇ (Nivîskar/Mamoste)

Mustafa ÇINAR (Serokê Avakar ê Platforma Medyayê)

Lijneya Zanistî ya Komxebatê:

Prof. Dr. Ahmet UYSAL

Prof. Dr. Ramazan YELKEN

Prof. Dr. Sami ŞENER

Prof. Dr. Tefvik ERDEM

Prof. Dr. Talip KÜÇÜKCAN

Prof. Dr. Yaşar HACISALİHOĞLU

Doç. Dr. Abdurrahman BABACAN

Doç. Dr. Adem PALABIYIK

Doç. Dr. Fatmanur ALTUN

Dr. İdris KARDAŞ

Metin SAKINÇ



ENCAM Û PRENSÎBÊN PÊŞNUMAYA MALBATÊN NOBEDARÊN ZAROKÊN XWE

18 Tebax 2022

Dîyarbekir/Li Pçşîya Mizgefta Kurşunluyê

Komxebata Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe ku di 17ê Tebaxa 2022yan de ji aliyê Komeleya Medyaya Civakî Mismed û Platforma Medyayê li Stenbolê bi mazûvanîya Şaxa Stenbol a Yekîtiya Nivîskarên Tirkîyeyê hate li dar xistin ji aliyê çapemenîya herêmî, neteweyî û navneteweyî ve eleqeyek mezin dît û bi serkeftin qedîya. Meqseda esil ya Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe, hasil bûye û hawara Dayikên Dîyarbekrê ku li hemû welêt belav bûye pişt re ev hawar li paytextên Ewropî yên wekî Berlîn û Emsterdamê jî deng vedaye û di warê akademîk û zanistî de jî qonaxa ku heq dike girtîye. Di komxebata me ya neteweyî de ku mijara wê nobeta dayîkan ji bo zarokên xwe bû bi tevahî şeş rûniştin pêk hat. Di her rûniştinê de sê yan jî pênc kes axivîn. Bi tevahî bîst û pênc kes pêşkêşî kirin û ji bo her rûniştinê mijarên sereke hatin tespît kirin. Di nav mijarên sereke de;

- Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe wekî failek nû ya civakî hatîye terîf kirin,
- Di warê têgeha keda hestîyarîyê de pêvajoya Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe hatîye destnîşan kirin,
- Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe di warê Sosyolojîya Medyayê de hatîye nirxandin,
- Aidîyet, bawerî û têkoşîna Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe hatîye destnîşan kirin,
- Profîla Sosyolojîk a Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe hatîye xêz kirin û
- Têkoşîna Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe li dijî terorê di çarçoveya Sosyolojîya Terorê de hatîye nirxandin.

Di encama sernavên ku di Komxebata Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe de hatine nirxandin, cardin hatîye fêhm kirin ku çî qas muhim e meriv Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe bike mijara camîaya akademîk û li ser wan xebatên akademîk pêk bîne. Komxebata me ji vir pê de ji bo piştgirîya xebatên ilmî û akademîk dê bibe referanseke muhim. Îro li pêşîya Mizgefta Kurşunlu ya Dîyarbekrê pêşkêşkirina metna encama pêşnûmaya zanistî jî di vê çarçoveyê de gelek muhim e. Lewra Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe ne bi tenê mijara sosyolojîya sîyasetê ne, ew êdî mijara sosyolojîya jîyana rojane û dîsîplîna akademîk in. Ev pêşnûma pişt re dê bi şiklekî 'ilmî û akademîk wekî metnek kamil dê bê çap kirin. Di vê çarçoveyê de maddeyên encama pêşnûmaya komxebata me ya ku pêk hatîye ev in;

Komxebata Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe wekî pêşnûmaya encamê prensîbên jêrê pêşkêşê camîaya akademîk û civatê kirîye;

1- Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe, ne tevgerek ku di berê de hatibe plan kirin e û ne tevgerek bi rêxistin e. Bi awayekî tebî'î di rêya xwe de dewam kirîye û bi şiklekî spesîfîk derketîye holê û pişt re çalak bûye.

2- Mahîyeta Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe bilindtirê nasnameyan e. Hatîye fêhm kirin ku tu malbatek, xwe bi nasnameyek cihêwaz îfade nekirîye li dijî vê ev malbat, nasnameyeke yekpare destnîşan kirine.

3- Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe ji ser habîtusa dayiktî û bawtîyê pêvajoyê didomînin. Ev têgeh nîşan didin ku Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe çiqas tebî'î ne û ew bi hissîyata xwedîderketina zarokên xwe ve ji sîyasetê serbixwe hereket dikin.

4- Bi saya Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe hate zanîn ku dayiktî û bawtî têgehên bilindtirê sîyasetê ne. Her du têgeh jî bi serê xwe xwedî ehemîyet in û yekpare ne lê belê bingeha malbatbûnê lazim e ku ji ser dê û bavan ve bê xwendin. Her wiha malbat ne hêmaneke sîyasî ye. Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe ji ser Dîyarbekirê ve belavê bajarên din bûye ku ev delîlek e li cem gel dayiktî û bawtî ji sîyasetê bilindtir tê dîtin.

5- Tevgera Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe tevgerek wisa ye ku di hundirê xwe de mesûmîyet û herêmîbûyînê dihewîne. Qada van malbatan, konên wan e û ev malbat li dijî terorîzmê bi sermayeya xwe ya ku bi konê bi dest xistine ve têkoşîn dikin.

6- Pêvajoya pratîk a ku Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe danîne holê êdî tevgereke nû ya civakî ye. Û di dinyayê de cara ewil tevgerek jinan li dijî terorîzmê diberxwe daye û serkeftî bûye.

7- Komxebat, digel xebatên zanistî û akademîk yê di derbarê Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe belgefilmên ku li ser van malbatan bê çêkirin û ji bo rûdanên ku hatine serê wan wekî çîrok bèn nivîsîn jî dê piştgirî bide. Bi vî awayî pêvajoyê dê çêtir were fêhm kirin û ev pêvajoyê dê zêdetir civakî be.

8- Helwesta Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe muhîmtirîn delîla hiş û bîranîna dîrokî û civakî ye. Alîyên ku dixwazin Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe di hişekî cuda ya civakî de heps bikin bi vê komxebatê dê bizanin ku Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe li dijî terorîzmê xwedî helwesteke protest e.

9- Ji bo Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe divê ku gelê Dîyarbekre zêdetir piştgirî bide da ku li hişê hevpar xwedî bê derketin û her wiha hatîye dîyar kirin ku aramîya bi tundîyê ne mumkun e pêk were ancax bi vî awayî pêk tê.

10- Komxebata Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe nîşan daye ku dîne Îslamê li herêmê hêmana herî girîng e. Îslam çimentoya herêmê ye û gel bi dîne Îslamê yekîtiya xwe pêk anîye. Divê ku perwerdeya dîne Îslamê ji ciwanan re baş bê dayîn û ciwan Îslamê di jîyana xwe de bijîn.

11- Komxebata Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe nîşan daye ku bi felsefeyeke tarîxê ya li ser 'ilmê ava bûye ve hêmanên civakî yê ku guherandina wan tê xwastin bi têkoşîneke hevpar ve tê qezenç kirin. Li ser zeman û mekanê mottoya serkeftina têkoşînê nîşaneya Komxebata Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe ye.

12- Komxebata Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe netîce girtîye ku divê sivîlbûn û herêmîbûna malbatan bê parastin. Ev tevgera nû ya civakî lazim e ku sîyasî nebe û ji kokên xwe veneqete.

13. Komxebata Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe nîşan daye ku ji bo jîyanê çêtir keda herî mezin ji aliyê jinan ve tê dayîn. Hem li civatên şerqê hem jî li civatên xerbê statûya jinan a nav civatê têkoşer e û têkilîyek ji dayiktîyê hêzdartir tune ye. Keda malbatan kedeke hestîyarî ye.

14- Komxebata Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe derxistîye holê ku ji bo daxilbûna meseleyên civakî ne hewce ye meriv teqez li benda qeneetek sîyasî be. Eger ku problem di çarçoveyê civakî de pêş biçe lazim e ku însiyatîfên sivîl ji bo problema heyî pêşniyazên çareserîyê yên civakî bikarin pêşkêş bikin.

15- Komxebata Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe derxistîye holê ku pêvajoya çareserîyê şkestineke muhim ya civakî ye. Gelê herêmê digel pirsgerêkên civakî ji vê pêvajoyê hêvîdar bûne. Û Dayikên Dîyarbekrê jî ji vê pêvajoyê hêvîdar bûne û sûd wergirtine.

16- Komxebata Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe nîşan daye ku li welatê me medya di derbarê malbatan de bi dereceyek kafi xeber çênake û balê nakêşe ser vê meseleyê. Ji ber vê di çarçoveya sosyolojîya medyayê de lazim e ku Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe zêdetir bê rojevê û têkîlya medya û civakê cardin bê terîf kirin.

17- Komxebata Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe; îspat kirîye ku sazîyên ji tundîyê sûd werdigirin û pêş dikevin dema ku tundî û kaos biqede ew ê bi tu awayî nekarin êdî hebûna xwe berdewam bikin. Lewra di vê pêvajoyê de dayîk zarokên xwe ji kaosê rizgar dikin.

18- Komxebata Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe dîyar kirîye ku teror û terorîzm bi kod û piştgirîya navneteweyî tevdiqere û ji ber vê lazim e ku mijara nobetê di çarçoveyek navneteweyî de bê nixandî û bi zûtî tora ragihandina vê mijarê lazim e ku derkeve asteke navneteweyî.

19- Komxebata Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe piştrast kirîye ku hemû sazî û tevgerên herêmê piştgirîyêke ciddî dane malbatan û ev malbat ji aliyê hêz û dînamîkên herêmê ve jî hatine qebûl kirin. Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe ji aliyê gelê herêmê ve bi tevahî hatîye qebûl kirin.

20- Komxebata Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe nîşan daye ku ev kar ji bo qedandina terorîzm û hevkarên wê şkestineke civakî pêk anîye û qalibên tirsê ku bi salan e nedihat şkandin bi saya van malbatan ve êdî şkestîye.

21- Di Komxebata Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe de bi taybetî hêza têgeha civaka sivîl ya li herêmê cardin hatîye nîşan dayîn û hatîye destnîşan kirin ku lazim e pêvajoya sivîl venegere pêvajoyêke sîyasî.

22- Di Komxebata Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe de hatîye tespît kirin ku têkoşîna serkeftî ya welatê me ku li dijî teror û hemû beşên wê hatîye dayîn piştgirîyêke mezin daye malbatên nobedar û pêvajoyê hêzdartir kirîye.

23- Komxebata Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe bersiveke hêzdar daye nîqaşên cinsîyetê yên rojevê ku jin, bi helwesteke têkoşer kodên civakî yên herêmê şkandîye.

24- Komxebata Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe destnîşan kirîye ku ji bo parve kirina êş û janên van malbatan lazim e ku reaksiyonek bê ava kirin û çîrokên bîyografîk bêne qeyd kirin û ev ne bi tenê bi Tirkî bi gelek zimanên din lazim e ku bê weşandin. Her wiha êşa malbatan dê kêmtir be û ev kar dê civakîbûnek pêk bîne.

25- Çawa ku di Rapora Qomisêrtîya Bilind a Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî de û di gelek raporên din de jî hatîye îfade kirin revandîna zarokan, ji bo rêxistinên terorî endam peyda kirin û zindî kirina terorîzmê û karên bi vî şiklî bi taybetî bi helwesta saxlem ya Malbatên Nobedarên Zarokên Xwe ve ji raya giştî re hatîye îlan kirin. Li dijî hemû xebatên xayin yê rêxistina terorê têkoşîneke çalak hatîye lidar xistin.

Ji bo raya giştî bi rêzdarî tê îlan kirin.